

Li Hesekekê

tevgera avakirinê li ber
mirinê ye.



Wênc: Elend Mihemed

PEYVA WELAT



Wê çaxê em ê vehesin.

Aras Yûsiv

2

Di nav nivîskarên rojavayê kurdistanê de çi li hundirê welat an li derveyî wî, herdem sedemeke sereke ji têkçûna gelek saziyên çandî re hebû û ew jî aborî bû, û tevî ku herdem ev sedem pirsgrêkeke mezin bû lê gelek nîfîş ji nivîskaran hebûn ku dîsan bi hewldanên nû radibûn da rojname yan kovareke kurdî biweşînin.

Helbet dema em dibêjin sedemên aborî roleke mezin di têkçûna van saziyan de lîstîye, ev nayê wateyê ku sedem in din tunebûn, ji ber sedema siyaseta hikûmeta Be'is li Sûryê dijî zimanê kurdî û qedexekirina wî ji nav sedeman yê her metirsîdar û bi bandor bû.

Îro dîsan astengiyên aborî li pêş serpêhatiyên nû disekin çî di berdewamî an nevebûna gelek saziyên çandî de û nahêlin ku ew serpêhatî berhmên xwe bigirin, ji ber piraniya hewldanên ku hatine kirin ta niha di warê medya çapkirî de li rojavayê kurdistanê hewldanên kesayetî ne, ji xwe eger bi vî rengî ev sazî hatibin avakirin temenê wan dê ne gelekî dirêj be.

Îro bi regekî cidî ji tevahiya aliyên tevgera kurdî tê xwestin ku li rewşa çanda kurdî binerîn ku ew jî ne kêmtir gelek rewş in din e ji pêwîstîbûna wê bi alîkariyê, ji ber ev sazî ew in yê bêtir ji her tiştî neynikên gelê xwe ne û dîroka wî dinivîsînin û gereke ji bin giraniyên barê aborî derkevin.

Kovara **WELAT**
Çandî- Giştî- Mehane

Sernivîser:
Aras Yûsiv

Desteya rêvebir:
Mihemed Zekî Mihemed
Hekîm Ehmed

Dizayner:
Hesen Berzencî



Têbînî: mijarên ku di kovarê de belav dibin, nerfna xwediyê xwe ne û nivîskar berpîrê wê ye

Mafê çap û ji bergirtinê, ji kovara WELAT re, parastîne

ji bo têkiliyê:

welatpress2014@gmail.com

www.facebook.com/Dengekurdistanasurya

Ev çend salên dawî ku li ser rojavayê kurdistanê derbas bûn, sal in hêja ne ku piştî wan îdî dest bi xwedîderketinê li saziyên çandî bê kirin, û îdî bê astengiyên aborî dest bi karê xwe bikin û ji dêv ku me berê li pêşiya pirtûkxaneyan rojnameyên ne bi zimanê kurdî bo firotinê didîtin, îdî em rojname û kovarên kurdî bo firotinê bibînin .

Di wê dema em kovar û rojnameyên kurdî bibînin ku gihane radeya rojane, mehane û demsalane an salane derkevin û li her bajarekî ji rojavayê kurdistanê bibînin ku ew tene firotin, em ê nas bikin ku dem hatiye em bihneke kûr bisîtin û bêjin: Aniha hinekî çanda kurdî bi xêr e . ■

تَبْنِي ثَوْرَة
adopt a revolution

Sîpe .. Du Caran Jidayik Dibe

Izedîn Salih

Rewşa ku welatê me bi giştî tê re derbas dibe, û nîrên hişk û zordar yên ku di ser me ve dibihûrin bandoreke wan a metirsîdar li ser ciwanan heye, bi taybet li ser kur û keçên ku di qonaxa sîpetiyê de ne, çimkî tê gotin ku sîpe du caran ji dayik dibe, herwiha hozanyar û pisporê psikolojîk yê Emerîkî Granvêl Stanlî Hol di lêkolînên xwe yên zanistî de vê yekê piştrast dike û dibîne ku jidayikbûna sîpe ya yekem qîrîna yekem ya hatina wî bo jiyanê ye, ya duyem jî jidayikbûna kesîtiya wî ye, û rola ku bav û dê dikarin di pêşbirin û damezirandina kesîtiya zarokên xwe de bilîzin.

Sîpetî çi ye?!..., sîpetî qonaxê hestiyar ji qonaxên temen e, ku keç û kur tê de dibihûrin, bi zimanê erebî em jê re dibêjin “Balix” ku bi wateya têgihiştî ango tekûzî tê, ji ber ku ew di pêvajoya laşî û hişmendî de ye, û qonaxa sîpetiyê ewe qonaxa ku di navbera qonaxên zaroktî û ciwanîyê de tê, ev qonax bi zarokan re ji temenê 11 salî ve dest pê dike, dibe ku ji 4-5 salan be, dibe jî ku ta 10 salan ve dirêj bike, herwiha bi destpêka gihiştina sîpetiyê re keç û kur di guherînên laş, zayend û yên derûnî re derbas dibin, ku ev guherîn nîşanên destpêka sîpetiyê ne, bi van guherînan re sîpetî di sê qonaxan de derbas dibe, qonaxên sîpetiyê jî ev in:

- 1- Qonaxa sîpetiyê a yekem: (11-14 salî) di vê qonaxê de pir guherînên biyolojî bi lezgînî dibin.
- 2- Qonaxa sîpetiyê a navîn: (14-18 salî) ew jî berdewamiya guherînên biyolojî ye, ta tekûzî û gihiştinê ye.
- 3- Qonaxa sîpetiyê a derengmayî: (18-

21 salî) ku hin ji sîpeyan tekûzî û gihiştina wan dirêj dike ta vê qonaxê.

Bi dawîbûna qonaxa sîpetiyê re raman û prînsîpên sîpe ber bi damezirandina kesîtiya wî ve diçin, jidayikbûna sîpe ya duyem ku me bal kişand ser ev e, dibe ku erênî be, û dibe ku neyênî be jî, ev bi xwe girêdayî ye bi rola ku bav û dê pê radibin bo damezirandina kesîtiya zarokên xwe bi dema derbasbûna zarokên wan bo qonaxa sîpetiyê re, çimkî zanyar û pisporên derûnî û perwerdeyê, gelekî balê dikişînin ser guhdan û danûstandina di navbera dê, bav û sîpeyan de, ku divê dê û bav ji zarokên xwe re palpişt bin û li wan miqate bin, dêmek bav dikare alîkariyê di çareserkirina hin pîrsgirêkên kurê xwe de bike, û dê jî dikare bibe hevala keçê xwe a sîpe, herwiha pêwîste ku dê û bav digel hev bi keç û kurê xwe re rûnên û li hevdû guhdar bikin, bi vî şeweyî dê û bav dikarin gaveke erênî bo damezirandin û pêşbirina kesîtiya zarokên xwe bavêjin.

Ev rewşa awarte ji şer, wêranbûn û tunebûnê ku em tê de dibihûrin bandoreke wê ya neyênî û metirsîdar li ser kur û keçên me yên ku di qonaxa sîpetiyê de ne heye, lewre min xwest ez balê bikişînim ser vê babetê, tev ku ev babet pir berfireh e û nivîseke wiha kurt wê têr nake, lê ya herî giring ewe ku divê tu carî hevaltî di navbera dê bav û zarokan de tîk neçe, herwiha sînorên rêzê jî bi bav û dê re neyên hilweşandin û pira baweriyê jî herdem eşkere û dûz be, ev tev dibin bingeha avakirina saz û durust ji nîfşê ciwanan re, ku dibin alava çalak di avakirin û pêşbirina civakê de. ■



Qêrîna Can û Wijdan

Ardewan Ehmed

Piştî hevqas sal ji kuştin û wêran û talankirinê, me digot wê dilê me hişk bibe, dilovaniya wî kêr bibe û nema dikevê bin bandora wêneyekê yan gotinekê, lê xuyan dike ku em hîn li mirovatiya xwe vedigerin û heştên me hîn tenik û nazik in, nexasim yê me, ev kesên ku hîna em li hundirê welêt in.

Bi dehan helwestên xembar bi me re derbas dibin, çî li kolanan yan li bazaran, çî li ser malperên internê û dîmenên tilvezyonan. Berî niha, di destpêka her helkeftê yan boneyekê de, gava em demeke bêdeng li ser canên pakrewanan radiwestiyan, bi rengê normal em disekinîn û derbas dibû, lê vê dawiyê bi dehên pakrewanên nêzîkî me têne bîra me û heştirên ziwa ji çavên me têne xwarê. Yan gava em wan cihên ku em li wan mane bi çavên xwe dibînin çî li wan deran bûye, ew bajarên mezin çawe wêran dibin û şênîyên wan têne kuştin, çî cara em deng û dîmenên bi şewat dibihîzin yan dibînin, bi dizî û bê deng em heştirên xwe ziwa dikin, em ji ber wan hêsiyan ji kesên derdora xwe fedî dikin.

Gava mindalekî 11 salî ji herêmeke dorpêçkirî difilite, em pêrgî wî dibin û ji me re dibêje: Me tenê nanê hişk di nav av û zehtê de dikir û



dixwar, ji ber ji wan pê ve tiştê tune bû, bêguman gotineke wî dibe sedem ku nava mirov bişewite û mirov berê xwe biguherê da ku ew mindal heştiran di çavên wî de nebîne yan jî serê xwe bixe ber xwe û bipûnîje.

Gelek caran stranek ji devê hunermendekî yan jî helbestek ji devê helbestvanekî dihêle ku giyanê me biheje û xosiya me di qirika me de bimîne, lê gava tu zarokê nehsalî dibîne ku du dar di bin çengên wî de ne û seqet dimeşe û piştî pirsariyê bersiv ji dayika wî kelogirî tê ku di encama teqîneke xwekujî de, bavê wî jiyana xwe ji dest daye û lingên vî kurê wê jêbûne, gelo beramberî helwesteke wî, wê heştên me çî bin? An gava mirov wêneyên zarokan di bin avahiyên bi bermîlên teqîner bumbebaran bûne û hatîne herifandin dibîne yan ew mindalê sêwî û birçî û pêxwas ku li ber mirinê dibêje: (Ezê her tiştî ji Xwedê re bêjim....) dê bersiva me weke mirov çî be? ■

3- تنظيم داعش الذي يقوم بشكل فاضح بسرقة وتدمير الآثار من خلال تعاقدته مع مقاولين لإجراء حفريات، كما أن التنظيم يوظف في سبيل ذلك الكثير من أفرادهِ ويقوم بدفع ما مقداره خمس الغنائم لكل من يقوم بجلب الغنائم الأثرية، وبعد ذلك أصبح يفرض ضريبة بنسبة 20% على الحفريات التي كانت تُرَخَّص لها، كذلك بعد عام 2014 اعتمد التنظيم على جلب خبرات لاستخراج القطع كما ذكرت صحيفة الغارديان البريطانية، وكان هؤلاء يتقاضون ما مقداره 30% في حلب و50% في الرقة على حد قول صحيفة التايمز البريطانية، ثم يعتمد التنظيم بعد ذلك إلى بيع حصصه من الغنائم الأثرية إلى مافيات وشبكات الآثار العالمية لتغطية تكاليف حربهم، حيث يجنون أرباحاً طائلة إذ يشكل تهريب الآثار بالنسبة لهم ثاني أكبر مصدر للإيرادات بعد النفط وقد قدر حجم الصادرات من بيعهم للقطع ما بين 2 إلى 3 مليار دولار.

تتم عمليات تهريب الآثار من سوريا عبر لبنان والعراق والأردن وكذلك تركيا التي باتت بعض مدنها مثل غازي عنتاب تشكل سوقاً رئيساً لعرض القطع الأثرية السورية وذلك حسب تقارير صادرة عن وكالة الأناضول وصحيفة الإندبندنت وأيضاً حديث مبعوث روسيا الدائم لدى الأمم المتحدة في مجلس الأمن،

فتزكيا هذه الدولة الإقليمية المجاورة أصبحت تشكل ممراً أساسية، ثم بعد ذلك تقوم جهات مختصة بعمليات التهريب بنقل القطع المهربة إلى الأسواق العالمية في إسرائيل وأمريكا وألمانيا وبريطانيا وبعض الدول العربية كالإمارات المتحدة.

غالباً ما يقوم المهربون المحترفون بتخزين القطع المنهوبة لفترة من الوقت كعملية للتبييض قبل طرحها في الأسواق السوداء ودور المزاد العلني حول العالم. ■

الآثار السورية وشبكات التهريب

رستم عبدو

منذ اندلاع الأزمة السورية في الشهر الثالث من عام 2011م، أصبح التراث الحضاري والإنساني فيها يعيش خطراً حقيقياً، حيث بدأ الخط البياني لتدمير ونسف ونهب وتهريب وتخريب المواقع بالظهور والتمدد منذ مراحلها الأولى حتى وصل الحال بها إلى درجة كارثية تهدد ببطي صفحات خالدة من عمر الحضارة الإنسانية.

وتعدّ تجارة الآثار أقدم تجارة في العالم وتُصنّف في الدرجة الثالثة على لائحة الجرائم، فمع اندلاع الأزمة في سوريا بدأت انظار تجار وسماسرة الآثار وشبكاتهما تتجه نحو الداخل السوري، ونشطت حركات التنقيب غير المشروع في عموم سوريا حتى باتت في بعض المناطق مصدراً لدخل الفرد وعوناً لبعض التنظيمات المقاتلة.

ففي عموم سوريا تشكلت شبكات التهريب التي يسّرت من عمليات التنقيب وسهّلت من نقل تلك القطع إلى البلدان المجاورة ثم إلى بلدان أخرى حيث الأسواق السوداء ودور المزاد العلني.

وتتألف شبكات التهريب من:

1- المواطنين البسطاء ذوي النفوس الضعيفة الذين يقومون بحفريات غير شرعية بدافع الحاجة أو البطالة، وينهبون كل ما تطله أيديهم، ملحقين أضراراً فادحة بالطبقات والسويّات الأثرية، ثم بعد ذلك يعرضون تلك القطع الأثرية وبأسعار بخسة على سماسرة الآثار الذين يقومون بدورهم ببيعها إلى شبكات عالمية بمبالغ ضخمة.

2- مجموعات أو عصابات تمتهن سرقة الآثار وتستخدم في عملها صور وخرائط ومعدّات متطورة.



وتأتي معظم مواد البناء من خارج المحافظة كالإسمنت الذي يأتي من محافظتي دمشق وحماه وكذلك الحديد والسيراميك وكافة لوازم البناء الصحية والكهربائية تأتي إلى المحافظة من باقي المحافظات السورية عبر بوابة قرية مبروكة ، وقد توقفت حركة استيراد مواد البناء من إقليم كُردستان منذ فترة بسبب إغلاق معبر سيمالكا الحدودي ما أدى إلى ارتفاع أسعار مواد البناء.

كما إن بعض مواد البناء تنتج في المحافظة، كمادتي البحص والرمل



النهري وتأتي من المقالع الموجودة على نهر دجلة في منطقة ديريك، ومادة الرمل السيلي وتأتي من المقالع العاملة في منطقة القامشلي وموقع سبع سكور جنوب شرق الحسكة، كذلك فإن القرميد والبلوك يصنعان محلياً من قبل بعض المعامل القريبة من مدينة الحسكة نتيجة لتوفر المواد الأولية اللازمة لصناعتها في المحافظة.

اليد العاملة في مجال البناء

تشهد المدينة نقصاً كبيراً في الأيدي العاملة والورش الفنية بسبب الهجرة إلى خارج البلاد نظراً للأوضاع الأمنية غير المستقرة والظروف الاقتصادية الصعبة التي تعصف بالمنطقة والغلاء الفاحش ، كذلك فإن الفئة الباقية من عمال البناء في المدينة تعاني أيضاً من قلة مشاريع البناء وعدم توفر العمل لأيام طويلة مما ينعكس سلباً على الاستقرار المعيشي للعوائل التي يعيلونها، وقد تضطر أخيراً لاختيار الهجرة كحل بديل أو البحث عن عمل آخر أكثر استقراراً لتأمين الدخل الذي يضمن معيشة أفضل.

ويقول خالد وهو نجار بيتون ويملك قالب خشبي للبناء، ربما سأضطر أخيراً إلى بيع خشب البناء الذي أملكه بسبب قلة العمل وتوقف حركة البناء بشكل شبه تام، إن استمرت الأوضاع بهذا الشكل في ظل فقدان مواد البناء من السوق واحتكارها وبيعها بأسعار مرتفعة من قبل التجار سأبحث عن عمل آخر.

معاناة العاملين في مجال البناء هي جزء من معاناة شعب بأكمله في ظل ظروف الأزمة التي تعصف بالبلاد والنزاع المسلح الذي أودى بحياة الآلاف من السوريين وتهجير الملايين من بيوتهم والحصار المفروض على مناطق كثيرة على امتداد البلاد والظروف الاقتصادية السيئة المرافقة للنزاع، والتي قد تدفع بالمزيد من شرائح المجتمع السوري إلى اختيار الهجرة كحل بديل لانسداد الآفاق أمامهم .

قبل لجنة المخالفات التابعة لمجلس مدينة الحسكة على البناء غير المرخص أصولاً، نشطت الحركة العمرانية في المدينة بشكل ملحوظ مع توفر مواد البناء والأيدي العاملة والورش الفنية، إلا أن هذا الربيع العمراني لم يستمر طويلاً في الحسكة مع اشتداد الأزمة السورية ووصول النزاع المسلح إلى أعتاب المدينة، لتشهد المدينة تراجعاً تدريجياً في حركة البناء وصولاً إلى حالة الوقوف التام في بعض الأوقات، وذلك بسبب الأوضاع الأمنية غير المستقرة في المدينة وهجرة الأيدي العاملة وورش البناء إلى خارج البلاد وارتفاع أسعار مواد البناء بشكل جنوني وفقدانها من السوق المحلية بسبب ظروف الحصار المفروض على المنطقة.

الحركة العمرانية في مدينة الحسكة مقارنة بالسنوات السابقة

تراجعت نسبة الحركة العمرانية في المدينة هذا العام بشكل كبير، وتقدر نسبة التراجع بحوالي 95% مقارنة بالسنوات السابقة، وتوقفت كافة مشاريع المقاولات السكنية في المدينة لتقتصر حركة البناء على بعض البيوت السكنية من طابق واحد أو عمليات الأكساء لبعض الشقق السكنية على الهيكل.

حركة شراء وبيع العقارات

كما تراجعت نسبة حركة الشراء والبيع للعقارات في المدينة بحوالي 80% مقارنة بالسنوات السابقة، ويؤكد عبد القهار وهو صاحب مكتب عقاري في حي المفتي بأن حركة البيع والشراء في أدنى المستويات وهي تقتصر على البيوت الجاهزة للسكن فقط، كما أن أسعار العقارات مرتفعة جداً بسبب انهيار قيمة الليرة السورية أمام الدولار الأمريكي وعدم توفر مواد البناء.



مواد البناء ... فقدان أو أسعار باهظة

أحد الأسباب الرئيسة لتراجع الحركة العمرانية في الحسكة هو عدم توفر مواد البناء ، وغلاء أسعارها إن توفرت، إذ يبلغ سعر كيس الإسمنت الواحد في السوق السوداء من 5000 ليرة إلى 7000 ليرة سورية، وسبب ذلك هو عدم وجود معامل لإنتاج مادة الإسمنت في المحافظة والاعتماد التام على الاستيراد، رغم توفر المواد اللازمة لصناعة الإسمنت في منطقة الغرة بجبل عبد العزيز جنوب غرب الحسكة إلا أنه لم يتم تنفيذ أية مشاريع لاستثمارها ، كذلك فإن سعر البلوك الواحد يتراوح بين 100 إلى 125 ليرة سورية، كما أن سعر المتر المكعب الواحد من مادة الرمل قد ارتفع من 500 ليرة إلى 5000 ليرة سورية أي ما يعادل عشرة أضعاف، كما يبلغ سعر الطن الواحد من حديد البناء 500000 ليرة سورية، وبعض مواد البناء كالسيراميك والنحاة الحبلية غير متوفرة غالباً في السوق المحلية .

واقع البناء في الحسكة

(واقع الحركة العمرانية في الحسكة)

سالار صالح

واقع البناء في الحسكة

7

والأرمن ، وقد شهدت المدينة نهضة عمرانية حديثة كبيرة وأقيمت حولها العديد من المشاريع الزراعية و الصناعية.

معالم عمرانية في المدينة

من أشهر معالم المدينة العمرانية كاتدرائية القديس مار جرجس التابعة لطائفة السريان الأرثوذكس والتي تنتصب في قلب المدينة، وهي ذات بناء جميل وفخم شيدت في عام 1956 وتعرف بين أبناء المدينة بالكنيسة الكبيرة (الكاتدرائية)، كذلك المسجد الكبير مسجد الصحابي معاذ بن جبل، وهو من معالم المدينة الرئيسية الذي يعرف بمأذنته العالية التي ترتفع 36 متراً بالإضافة إلى دار الحكومة (السراي)، وثكنة (عقبة بن نافع)، وكذلك بناء كنيسة الكلدان الكاثوليك بتصميمها وبنائها المميزين تعتبر من أجمل الكنائس في المدينة .

واقع الحركة العمرانية في زمن الأزمة

مع بداية الأزمة السورية ونتيجة لتراجع سلطة أجهزة الدولة والرقابة التي كانت تفرض من

تقع مدينة الحسكة في الشمال الشرقي من سوريا على نهري الخابور والجغجغ، وهي مركز محافظة الحسكة ، وتقع في منطقة غنية جداً بالمواقع والتلال الأثرية قامت بها أعرق وأقدم الحضارات في منطقة الجزيرة (ما بين النهرين)، وتتميز بخصب أراضيها ووفرة مياهها و جمال طبيعتها و كثرة مواقعها الأثرية.


تاريخ المدينة المعاصر بدأ في نهاية القرن التاسع عشر وبداية القرن العشرين، وكانت عبارة عن موقع و ثكنة عثمانية أقيمت في تلك المنطقة لأهميتها الاستراتيجية وتمّ بناء مركز لفرقة عسكرية وذلك عام 1907م ، بُنيَتْ في عهد السلطان عبد الحميد الثاني، ثم استولت عليها لاحقاً القوات الفرنسية أثناء فترة الانتداب الفرنسي على سوريا، وعندما تمّ الاستقلال بجلاء الفرنسيين عن الجزيرة الذي بدأ في منتصف عام 1945م ، كانت الحسكة مدينة لها سراي وبيت للمحافظ منذ عام 1930م عندما انفصلت الحسكة عن متصرفية دير الزور. يسكن الحسكة خليط من الكُرد والعرب والسريان



Hevpeyvîn bi nivîskarê Kurd “Newafê Bişar ê Ebdulla” re.



Hevpeyvîn: Dilaşad Xalid



1- **B**i navê kovara Welat bi xêrhatina we dikim. Mamoste tu dikarî di warê nivîsandinê de ji xwênerên Welat re, xwe bidî nasîn?

Ji bo dana vê derfetê ku ez nerîn û baweriyên xwe bi xwendevanên zimanê Kurdî re parve bikim, we spas dikim û weha xwe didime nasîn. Sala 1956an Newafê Bişar, li gundê Til Xizal hatiye dinê. Sala 1976an Lîse li bajarê Qamişlo bidest xistiye û sala 1981ê Endezyariya Şaristnî (Civil Engineering) ji Zanîngeha Helebê wergirtiye.

Ji sala 1970î ve, ew fêrî Elfabeya Kurdî bûye û ji ber kêmbûna Kovar û pirtûkên Kurdî, wî hin dîwanên Seydayê Cegerxwîn û pirtûkên Erebe Şemo bi dest xistine, xwendine û her çûye, evîna zimanê dayikê di dil û hişê wî de mezin bûye.

Sala 1987an, ew bûye endamê desteya kovara GELAWÊJ û bi navê ZOZIK kurteçîrok di wê kovarê de weşandine.

Ew yek ji endamên desteya kovara PIRSê bûye, yê ku navê wê vebijartine û hejmara wê ya pêşîn li Newroza sala 1993an

weşandine û hêj ew di desteya kovara PIRS û weşana NEWROZ de endam e.

Bi navê Rêberê Silîvî û Serdar Bedirxan, wî gelek gotar di kovara PIRS, Weşana NEWROZ û kovara Elhîwar û hin malperan de bi zimanê Kurdî û Erebi weşandine. Hin gotar ji Zimanê Kurdî wergerandine ser zimanê Erebi. Ta roja îro, ew di nivîsgeha xwe ya Endezyariyê ya taybet de, li bajarê Qamişlo kar dike.

2- **Di demekê de zimanê kurdî yê nivîskî hîna ewqasî belav nebûbû, ezmûna we bi kovaran re, çî karîbû di vî alî de bi dest bixe?**

Bi Kurtî, bila rê li ber çanda zikreşî, berberîya bûye sedema malwêrana Kurdan bigrin, teng bikin, li şûna wê, çanda rêzgirtin û hezkirinê biweşînin da civaka me saxlem bibe û li hember pîlanên neyaran li ber xwe bide.

Rast e. Demekê xwendin û nivîsandina bi zimanê Kurdî qedexe bû. Di pêzan û pîvanên rijemê de, ew gunehekî mezin bû. Bi wî sûcî jî, gelek nivîskar hatine zindankirin, lewra, gelek

nivîskarên zimanê Kurdî berhem û weşanên xwe bi navên nehênî dane weşandin.

Nivîsên me yê wê demê di naverok, rastnivîs û babetên xwe de qels bin jî, lê di bawerîya min de ew ji bo hezkirin û girêdana nîfşê nû bi zimanê dayikê ve bingeheke baş bûn, wan nivîsan, xeleda hezkerên zimanê Kurdî fireh kirine. Ji bilî nivîsên xwe, me berhemên helbestvanên me yê payebilind û navdarên mîna Seydayê Cegerxwîn, Bêbuhar, Seydayê Tîrêj, Mele Ehmedê Palo, Mele Ehmedê

Namî, Ehmedê Şêx Salih, Seydayê Keleş, Mele Nûrîyê Hesarî, Emerê Lelê... hwd, di kovarên xwe weşandine û hevpeyvîn bi wan re kirine. Bi kurtî ez kar û xebata kovarên bi zimanê Kurdî li Sûriyê di merc û hoyên qedexekirin û veşartinê de bi payebilindî û erênî dinirxînim.



Ji milê çepê ve: Mihemed Qere Hesên, Merwan Berekat, Dr. Rozad Eli, Rezoyê Osê û Newafê Bişar (Beşek ji desteya Kovara PIRSê).

3- Çi sûdeya wergerê li ser çand û wêjeya gelan heye? Newafê Ebdula niha bêhtir bi çi wergeran mijûl dibe?

Bi rêya wergerê, gelên cîhanê wêje, folklor û dîroka hev dinasin, nêzîkî hev dibin, ji hev fêr dibin û têkiliyên dostanî û biratiyê bi hev re saz dikin. Herweha bi rêya wê, çanda nûjen a aştxwaz û mirovheziyê sînoran derbas dike, li şûna şer, pevçûn û wêrankirina welatan, werger gul û nêrgizan diçîne. Tenê ez bi wergera Kurdî Erebi û Kurdî Kurdî mijûl im, hin ji wan di warê dîrokê, hin jî di warê rêzanî û civakî de ne.

4- Mamoste, te ji 1-13 ji hejmarên rojnameya Kurdistan, ji tîpên Erebi veguestiye tîpên kurdî yên latînî, gelo girîngiya xwendina rojnameya Kurdistan ji nîfşên nû re heye?

Belê, di nerîna min de, pêwistiya hemû xwendevan û nivîskarên zimanê Kurdî bi xwendina berhemên Kevin yên mîna

Rojnameya Kurdistan, Kovara Hawar, Ronahî, Roja Nû, dîwana Cezerî û Mem û Zîna Ehmedê Xanî heye, ji ber ku mirov ji wan fêrî wêjeya resen a bav û bapîran dibe. Li hêleke din, eger em dîroka ziman û wêjeya xwe nas nekin, em ê nikaribin çand û wêjeya xwe pêşve bibin. Min bihîstiye ku nivîskarê Kurd ê navdar birêz M. Emîn Bozarselan

hejmarên Kurdistanê wergerandine ser tîpên Kurdî latînî, lê mixabin ew bi dest min neket. Eger derfet hebe, ezê hejmarên Kurdistanê yên mayî jî wergerînim ser tîpên Kurdî latînî da hemû xwendevanên Kurd karibin "Kurdistana" xwe bixwînin.

5- Rewşenbîrê Kurd Hemze Begê Muksî, tevî jêder li ser pir peyda nabin, we guhdanek

taybet bi jînenîgarî û xebata wî kiriye, çima Hemzeyê Muksî?

Li sala 1991ê, di serdaneke min a goristana gundê Dugirê yê nêzîkî Tirbespiyê de, min çend wêne ji kêlên gora buhuştî Hemze Begê Muksî re kişandin û ew li cem xwe parastin. Helbesteke Kurdî ya pir xweş û watedar li ser kêla wî hatibû nivîsandin. Hin camêr dibêjin ku ew helbest ya hozanê Kurd ê navdar ê Kurdistana Îranê Hejar Mukiryanî ye ku wê demê ew li Tirbespiyê dijî.

Min gotareke danasînê bi vî rewşenbîrê dilsoz, bi navê Rêberê Silivî di hejmara 23an a kovara Gelawêjê -1992an de weşand.

Piştî çar salan, careke din riya min bi goristanê ket, mixabin, min dît ku her du kêlên wî ji cih hatine hilkirin û li kêleka gorê dirêjkişî ne. Yek ji wan nîvşikestî û ya din jî, qet-qetî bûye, nivîsa li ser wan berebad bûye. Paşê ji min ve hate zanîn ku ne tenê kêlên Hemze Begê, lê belê yên gelek mezinên Kurdan li wê goristanê bi destên gemar yên hin kesên girêdayî dezgehên ewlehiyê hatibûne şikandin.

Bi alîkariya çend xortên Kurd ên welatparêz û li ber ronahiya wan wêneyên ku berî wê bi çar salan min ji kêlan re girtibûn, me keline nû dane çêkirin û roja 13.11.1995an, me gora buhuştî Hemze Begê Muksî bi tevayî nû kiriye û ew ji windabûnê parastiye.

Sala 1918an, li Stenbolê, Hemzeyê Muksî, kovareke bi zimanê Kurdî û tirkî weşandiye, ramanên Kurdewariyê belav kirine, ji ber xebata wî, biryara dardakirinê derheqa wî tê sitandin. Hemze Beg derbasî binxetê dibe û li Sûriyê dijî. Ew pêşgotineke watedar ji Mem û Zîna Ehmedê Xanî re bi navê "Hemze" dinivîse û yekemîn car çap û belav dike. Ango ew mirovekî zîrek û xebatkarekî gewre bû.

6- Tu siberoja çand û zimanê kurdî çawa dibînî?

Ez geşbîn im ku berê ziman û çanda Kurdî li geşbûnê ye. Îro li seranserê Kurdistanê û li derveyê welêt bi milyonan keç û lawên me bi zimanê dayika xwe dixwînin, dinivîsin û xwe pê payebilind dibînin, pirtûk, rojname û kovaran diweşînin, ji bilî dezgehên ragihandinê mîna tv, malper û îzgehên bi zimanê Kurdî ku bi sedan têne jimartin. Zimanê me îdî ber bi pêşveçûnê ve diçe, tu gef û metirsî li ser hebûna wî nemane.

7- Pirsgirêkên li ser rastnivîsê ku em carina di heman pirtûkê de, peyvekê bi du şeweyên nivîsandinê dibînin, dê çawa çareser bibin?


Rast e, pirsgirêkin bi vî rengî hene, lê di çarçewa avakirina komîteyekê ji zimanzan û pisporên zimanê Kurdî, ev pirsgirêk dê çareseriyê bibîne.

Ji hemû berpirsên ragihandina Kurdî tika û hêvî dikim ku parzûn û pîvanên wan ên weşanê hebin. Ango ne her gotar bête weşandin û ne her nerîn were belav kirin, nemaze jî ew gotara jehirkirî ku geşa tevger û civaka me tevlihev dike.

8- Gotina dawî ji xwênerên Welat re?

Rêz û rûmeta xwe ji xwendevanên WELAT û hemû xwendevanên zimanê Kurdî re pêşkêş dikim û ji hemû berpirsên ragihandina Kurdî tika û hêvî dikim ku parzûn û pîvanên wan ên weşanê hebin. Ango ne her gotar bête weşandin û ne her nerîn were belav kirin, nemaze jî ew gotara jehirkirî ku geşa tevger û civaka me tevlihev dike. Bi Kurtî, bila rê li ber çanda zikreşî, berberîya bûye sedema malwêrana Kurdan bigrin, teng bikin, li şûna wê, çanda rêzgirtin û hezkirinê biweşînin da civaka me saxlem bibe û li hember pîlanên neyaran li ber xwe bide.

Careke din silav bo hemû karmendên kovara WELAT û xwendevanên wê yên rêzdar. ■



Berbanga ku dayîk bê hêsir girîn!

Îdrîs Nehasn

Di berbanga reş de, Kobaniyên ku di xewna destpêka roja nû de bûn, hê ji xewa şêrîn şiyar ne bû bûn. Weke her car li benda tîrêjên rohaniyê bûn, li benda çalakiyên berdewamkirina ji hev derxistin û ji nûve sazkirina malên xwe bûn. Wan ji kavi û roxandina bajarê xwe bêhtirî apartman û alt û îstên welatên din hez dikir in. Bêhna wan li koçberiyê çikiyabû û hedana wan bi jiyana dûriyê ne dihat. Bi lezgînî berê xwe dabûn mal û welat û gotibûn "konek li ser kavi û me ji herî bilindtir avahiyên biyaniyan giranbuhatir e". em ê herin li Kobaniyê ji xwe re konekî bikar bînin, lê em piştî rêzgarkirina axa xwe li vir namînin.

Karwanên vegerê bi lez dihatin, kenê li ser lêvên wan pir şîrîn hildihatin, û hêvî bi dilgermî ji hinavan derdihatin. Roja Kobaniyê li hemû deveran ronîtir dibû û navnîşana wê bê şîrovekirin pê nase dibû, lê hîn bêhna xwînê ji av, ba û axa wê giran dihat.

Di berbagna sibê de, di berî qîrînên dîkan û bangwaziya melan Ezraîl destê xwe hilmalandibû û lîsteyek mezin ji zarok, jin û hemû temenan nivisîbû. Ne xewnên zarokan bi bîr xistibû û ne jî kenê di xewa wan de berçavkiribû, tenê kêra mirinê tûj û biriqandibû.

Kûjerên dil reş, zik reş û hov raman, li gor baweriyên xwe yên têrorîst, doza bihuştê dikirin û bilez li bende dîtina horiyên bûn. Zarokên li ber şewata kêran, herkandina xwînê û tirs û taya mirinê ya sar diqîran, dilê wan ne êşandin, kezêba wan jî ne livand in.

Bi dilekî tiji hêrs û kîn, bi hovîtiyeke ji ya hemû

ajal û cinawiran mezintir, wan zarok bê serî kirin, dayîk, astengdar û kalemêr gulebarandin. Ne digotin leşker e, siyasetedar e, oldar e an jî ne bawer e. Tenê digotin bikujin evên bê ol, evên kafir bikujin. Ji lewre bi lezgînî dixwestin di bin sîwana berbangê de, herî mezintir jimara kuştinê bikin. Û wan bi rastî piraniya qurbaniyan veşartî kuştin. Kesên dengê fişekan bihîstin, wan jî gule berdan, û bi rêzgarkirina deverê nû, weke her car şabûn. Lê wan nezanîbû ku bi kuştina hemwelatîyên xwe yên bê hawar û bê qîrîn şadibûn. Matmayî man, şaş û wenda bûn, kî wan dikuje, çawa ev çê bû, çima, û ka û hwd..... pirs di serê wan de radibûn?.

Dîsa bi destê zarokan girtin. Xwas û tazî, çav bi hêsir, term û laşên kuştî û birîndaran li paşxwe hiştin. Li ber sînorê girtî û di nav daristanê de kesên zindî lihev civiyan, lê li paşxwe, li bajarê ku di bêhna xwînê û tariya agirê şer de wenda dinerîn û ji koçberiya berê bêhtir tirsîya bûn.

Careke din darbestên mirinê hatin hildan, goristaneke din ava bû, lê dilên gel nigîriyan. Ne di êşiyên, ne jî hêsir barandin, ew tenê di wêneyên berbanga mirinê de bûn. Di xelesa xewnên nîvçe, sibêha ku nehilat wekî her car û hawarên ku bi şahiyê hatin pêşwazîkirin de digeriyan. Hêdî hêdî kevîrê xwe didan ser dilên xwe û wêneyên her sê rojên komkujiya berbangê dicivandin û di bîranînên xwe de vedişartin. Hin kes bi hinavên birîndar li koçberiyê vegeriyan, lê yên din ji agirê axînen xwe hêrseke mezin afirandin û careke din di kavi û Kobaniyê de jîyan. Kobanî weke dayîkek temen mezin piştixwarbû, brîndarbû û nedikarîbû li ser kuştîyên xwe bigiriya, wê tenê dilorand û digot: "Îro min baş zanî ku her çiqas hûn nakokdarbin, lê dijminên we hemû yeke, xwîna we li ser xaka min tevîhev dibe û dijmin we cûda nakin."

Çima hûn van tiştan cûda nakin?. Lê hûn ticarî cûda nakin!

Têbîn: Di berbanga ku di 25, Pûşpera/Hizêrana 2015 de çêbû, 251 kuştî, 267 brîndar, 37 zarok û 77 jin- 3 ji wan du canî- bûn. Hemû sivîlîn.

11



Rewş û debara jiyanê li Kobaniyê.

Şêrîn Temo



Tevî wêranbûn û şerê ku li nêzikî wê digere, bajarê Kobanî ji ber dorpêçbûna Rojava, di aloziyêke aborî ya giran re derbas dibe, herweha ev alozî ji ber bilindbûna rojane ya pereyê biyanî (dolar) e jî, ew pereyên ku ji destpêka şoreşa Sûryê û vir de bêhtirî deh qatan li hember lêreya sûrî bilind bû, ji ber vê jî mûçeyê karmendan yê ku berî şoreşê bi qasî 250 dolarî emerîkî bû, niha ew mûçe bi qasî 50 dolarî tenê ye, tevî ku ew hîn ji berê bilindtir bi pereyên sûrî. Hemû karmendên li bajarê Kobaniyê gilî û gazinan ji ber vê rewşê dikin.

Xalid Cerada karmendeke di Rêveberiya Perwerdeyê de li kantona Kobanê, gazinan ji ber mûçeyê xwe yê ku têra pêdawîstiyên mala wî nake, dike û nemaze ku zarokeke wî heye, û ew neçar dibe ku bi pereyên mûçeyê xwe şîr jê re bikire, ev yeka jî lingê wî ji alî aborî dixê soleke tengtir de, çunkî pereyên mûçeyê wî têra şîrê zaroka wî nake, de ew dê ji ku bixwin ???!

Aloziya darayî ya ku karmend û karker dijîn li Kobaniyê, dike ku jin û zarokên wan jî li karekî li derveyî malê bigerin û bikin, ev jî arîşene ji

rengêkî din peyda dikin, ji ber ku jin nikare karekî li derve bike û bi erkên xwe yên malê bi temamî bi hev re rabe, ev yeka jî arîşene rojane ji wê re peyda dike. Xanima bi navê Merwa ku wek kuwafêr kar dike, dibêje ku ew neçar e ku ew li derveyî malê kar bike ji bo ku alîkariya mêrê xwe yê karker di xerciyê malê de bike, çunkî mûçeyê wî ti carî têra xwarina zarokên wan nake, nemaze ku mala wan di şerê Kobaniyê de wêran bûye, ew mala ku mêrê wê bi salan kar kir ta ku karîbû bikir e.

Sertî û djiwariya aloziya aborî li bajarê Kobanî ne kêm e ji diwariya wêranbûna ku di bajêr de qewimî û ji şehîdketina zarokên wî bajarî li ser wê axê, ew bajarê ku şênîyên wê jiyan li ser axa ku zarokên wan li ser şehîd ketî xweştir dîtin ji jiyanê li bajarên Ewropî, lê dorpêçbûnê û aloziya aborî ti derfet ji jiyanê nehiştin e. ■

Li Tirbespiyê, sûka Duşembê

Yasmîn Hesen



Mirov neçar e ku her roj berê xwe bidê nava bazarê, da k pêdiviyên xwe ji xwarin, şînahî, cil û vexwarinê ... bidest bixe, û piştî aloziya li sûryê bi giştî u li hrêma kurdî bi taybetî rûda ye, mirov neçar dibe ku ew li nava bazarê bigere, da ku bi buhayekî erzan pêdiviyên xwe peyda bike, ji ber ku piraniya welatiyan di jêr asta hejariyê de dijîn. Sûka Duşembê, yek ji sîkên gelêrî ye li bajarê tirbespiyê û derdora wê navdar e, vê sîkê navê xwe ji navê roja ko ew têde tê li darxistin wergirtî ye, ku roja Duşembê ye ji her heftiyekê, dîroka vê sîkê vedigerê berya bihtir ji 20 salan, vê sîkê gelek cihên lidarxistina xwe guhertin e, lê cihê dawî yê ku sîka Duşembê lê tê lidarxistin, ewe li pêşiya gulîstana pakrewanên 12 ê Avdarê ye, kuli başurî bajêr e.

Her roja duşembê welatî seredana vê sîkê dikin ji destpêka rojê de, li vê sîkê mirov dikare her tiştê ku mal û xêzan pê hewceye bibînin û bikirê, mîna şînahî, cil, merş, alavên elektirîkê û xwarin, ev hemî tiştên tene dîtin û bi nîrxekî erzantir ji bazara bajêr, di nava vê bazarê de tene dîtin, ji ber vê yekê ji welatî berê xwe didin Sûka Duşembê.

Mirov dikare roja Duşembê nasbikê bê ku li rojnameyê vege e, dibe ku mirovek bipirs e: Çawa?. Bersiv jî pir hêsan e, ew jî ewe ku roja Duşembê liv û tevgera li Tirbespiyê ji rojên din cuda ye, bitaybet ji aliyê jinan ve ji ber ku piraniya kesên seredana sîka Duşembê dikin jin in, û gelek caran welatiyên ku girêdayî karekî ne, ew destûrê dixwazin da ku ew karibin berê xwe bidin sîka Duşembê, û pêdiviyên xwe pêkbînin, di roja Duşembê de mijara sereke ya ku welatî guftûgoyê li ser dikin ewe gelo buhayên sîka Duşembê yan jî buhayên sîka bajêr erzan in.

Tiştê di sîka duşembê de ku bala mirov dîkîne, ewe tevliheviya ku ev sîk pê tene naskirin, û dema ku tevliheviyek li cihê tene

peyda kirin xelkê Tirbespiyê dibêjin: Ma ev dever bû wek sîka Duşembê?!!!

Ev sîk bi sîka hejar û feqîran tene naskirin weke ku welatî nav lê dîkin, ji ber nîrxên erzan yê ku li bazarê tene dîtin, lê ne tenê hejar û feqîr tene vê sîkê, tene û zengîn jî tene sîka Duşembê da ku pêdiviyê malên xwe bikin.

Firoşkerên vê sîkê ne bi tenê ji bajarê Tirbespiyê ne, lê ew jî ji bajar û bajarokên cur bi cur in, mîna Qamişlo, Çilaxa, Grkê Legê

Bi nerîna welatiyan ev sîk ji wan re derfeteke mezin e, da ku pêdiviyên xwe ji dema heftiyekê re amade bikin, angû (ji Duşembê ta Duşembê), lê ji berê ve tiştê nebaş û şaş li nava vê sîkê peyda dibê ko ew jî dizî ye, dizî car caran li vê sîkê çêdibê ji ber wê tevliheviya ku em berya niha li ser axivîn, ev dizî çêdibe dema ku bazirgan bi xelkê ve mijûl dibe, ji ber vê yekê piraniya bazirgan zarokekî bi xwe re tene da ku çavdêriyê bike û arîkariya wî bike, da ku tu kes nikaribe diziya wî bike.

Dema ko mirov derbasî nava sîka Duşembê dibe ew dikare bibîne ku tevlihevî ji aliyê belavkirina curên firaxa ve li ser erdê heye, angû bazirganê şînahiyê li kêleka bazirganê cila ye û,HWD , her bazirganek konek yan otombîlek yan erdê ji xwe re bi kar tene da ku bazarê ji xwe re bikê û cihêkî taybet ji xwe re vedetîne, û gelek caran pîrsgirêk di navbera bazirgan xwe bi xwe de derdikevin, ji ber cihê ku ew dixwazin lê bazarê bikin.

Ne bi tenê li Tirbespiyê ev sîk heye, li her bajar û bajarokê ev sîk hene, lê bi navên cuda ku ew jî bi navê rojan tene binav kirin, mîna sîka Pêncşembê, sîka, Çarşembê li qamişlo, piştî rewşa aloz li herêma tevgera van sîkan xurt bûye, ji ber nîrxên wan yê erzantir ji nîrxên sîkên bajêr yê sereke ku digihe ji 20 - 15 %, li kîjan cihê bê welatî li nîrxên erzan digerin. ■



Li Dirbêsiyê Komeleya (Sibê xweştir e).

Hisên El Sîno

Şoreşa Sûriyê, li ber xelkê gelek qadên jiyanê ku nêzîkî dilê wan in vekirin, ew derfetek bû da ku bê çavsorî û zextên siyasî, çandî û civakî, karibin kar bikin. Helbet, gerek e ku karên civaka sivîl û komeleyan geş bibin, mane şoreşa Sûriyê li ser vê bingehê çêbû? Durişmên wê yên sereke ev bûn: Bijî jiyanê azad û bi rûmet bê çewisandin û tirsê.

Ji dema ku çirûska şoreşa Sûriyê di sala 2011 de veket û ta derbasbûna xwe ya sala şeşemîn, gelek projeyên manê, ji aliyê rêxistinên partiyên siyasî yên kurdî û kesên serbixwe berçav dibûn, paşê jî komeleyên çandî, civakî, sivîl û yên xêrxwaziyê li hemû herêmên Sûriyê û bi taybetî jî li herêmên kurdî hatin damezrandin.

Em ê di vê rapora xwe de, li ser komeleyekê li bajarê Dirbêsiyê bipeyivin ku hêjayî ronîdan û guhdanê ye, komeleya (Sibê Şîrîntir e)

ji bo xwediyan pêdiviyên taybet dixebite, di 03/11/2015an de hatiye damezrandin, bi rêvebirîya komeke ciwanan, ku serbixwe û bê piştgirî karê xwe dikin, dema berê dora 100 kesên hewcedar li ba wan tomkirî hebûn, lê ji ber rewşa aborî ya dijwar, niha hew 15 nav li ba komelê hene ku bi wan re têkildar in, xizmetên vê komelê ji bo astengdaran li bajarê Dirbêsiyê di gelek waran de xuya dike, bi taybetî di warên xêznivîsê, muzîk, spor û hînbûna nivîsandin û xwendinê de, xule lidar diketin.

Li nik komelê pisporên hene alîkariyên xwe pêşkêş dikin weke duktorên derûnê û yên zarokan, herwiha komele karîbû bi hevkarên xwe re fêkêse taybet, firavîna her roj û karê pênc rojan ji hefteyê peyda bike.

komeleya (Sibê Şîrîntir e) ji bo kesên kêmandam bi gelek çalakiyan rabûye û seyrana biharê li gundewarê bajarê Dirbêsiyê û bajarên û gundewarên deverê ji wan re lidar xistine û roja cîhanî ya ji bo astengdaran, cejna sersalê, cejna evînê û cejna karkeran "1ê Gulanê", vejandine, vê hiştiye ku di dilên gelek kesan de şahî peya bibe, weke ku jiyan ji wan re bi damezrandina vê komeleyê nû bibe, bi riya wê hinek mafên xwe standine û li ser zimanê her yekî ji wan spasî û kêfxweşî li ser van karan heye, ev tev di dema ku jiyan zehmet bûye, lê hêvî kilîta jiyanê ye, wê hêvî jî bimîne.

Di dawiyê de, rewşa astengdar û kêmandaman bi rêya hest û dilê wan xweş dibe û weke durişma vê komelê li bajarê Dirbêsiyê dibêje (Kêmaniya mirov ne bi endaman e, kêmanî ya hişyarî û bîreweriyê ye), ji bo berdeamiya vê komelê û da ku weke navê xwe karibe bihêle (sibê şîrîntir) be, hêja ye ku xebata wan were pesindan û her kes di bajêr de, rêxistinên xêrxwaziyê û yên sivîl û yên siyasî, alîkariyê bi wan re bikin. ■

14



Hevaltî bi pirtûkê re

Umer Ehmed

Dema ku mirovek bixwaz e şaristaniya bajarekî nas bike, dive li pirtûkxaneyên wî bajarî biger e û lê binêr e, ji ber ku şaristanî her tim xwe nûjen dike.

Di her rewşan de rewşenbîr şaristaniya bajarê xwe avadikin û diparêzin, lê di nav rewşa ku sûryê tê re derbas dibe bi taybetî bajarên rojava ev rewşa xerab nebû kelem li pêşiya pêşketina karê şaristanî û rewşenbîrî yê.

Dema ku em li kolanên bajarê Dêrikê digerin tiştên ku herî bala mirov dîxîn e, firoşgehên alavên dibistananin, lê tiştên herî baş avakirina pirtûkxaneyan e.

Yek ji van pirtûkxaneyan ku ava bûye, pirtûkxana Vanîsiya e, ku gelek pirtûkên giranbuha di nav baskên xwede veşartin e. Xwediyê pirtûkxana vanîsiya Azad Dawûd li ser vê mijarê ji kovara welat re axivî û wiha got: Min karê kirîn û firotina pirtûkan ji kevin de dikir ji dema



ku min li bajarê Şame dixwend.


Di sala 2012 an de ez vegeriyam bajarê Dêrikê û min xwest pirtûkxaneyekê vekim.

Ta niha ez pirtûkên xwe ji malan û pirtûkxaneyên bajarê qamişlo dikirim, lê ez nikarim ji Şamê bînim ji ber bihabûna nirxên gihandina wan.

Di warî ragihandina vê projeyê de hemî aliyên siyasî piştgiriya min kirin, lê ji aliyê aborî ez tu alîkariyê ji tu kesî napejirînim û min gelek pirtûk diyarî pirtûkxaneyên partiyan kirin.

Ev proje diyar dike ku rewşa rewşenbîrî li bajarên rojavayê Kurdistanê li pêşe tevî reşa xerab ku miletê me tê de dijî û wê rojek were ku em wek van projeyan ji xwe re bingeh bigrin. ■

15



الكثيرة المنتشرة في وادي نهر عفرين وجبل الأكراد، يقع في منتصف الانحدار الغربي لجبل ليلون، في المنطقة الواقعة بين قريتي برج عبدالو وغزاويه، وفي واد يحمل نفس الاسم «دوده رييه» ويبعد الكهف عن مدينة عفرين مسافة 13 كم جنوباً، وعن الطريق المعبّد بين قريتي برج عبدالو وغزاويه نحو 2/ كم شرقاً، وعن نهر عفرين في الغرب مسافة 4/ كم، أمّا ارتفاع موقعها عن سطح البحر فيبلغ 450 م.

ينحدر وادي «دوده رييه» بشدّة نحو الغرب بحافّتين شاهقتين، فإذا وقف المرء في منتصف الوادي، ونظر جنوباً فسيروى «على ارتفاع 100 م تقريباً» الباب الشمالي للكهف على هيئة قنطرة مطّلة على الوادي من قمّة المنحدر.

ولكهف «دوده رييه» بابان، الأول: شمالي يشرف على الوادي، أبعاده: 8/ م عرضاً و 5/ م ارتفاعاً، والثاني: في الجهة الجنوبية، يشبه مدخنة طبيعيّة واسعة، متوسط قطره نحو 8/ م ومفتوح باتجاه السماء بمستوى استواء الجبل، بحيث تتعدّد مشاهدته قبل الوصول إليه، وبجانب هذا الباب فسحة ترابية منبسطة. أمّا عمق الكهف فيبلغ نحو 30 م، وارتفاعه عند الباب الجنوبي «المدخنة» حوالي 8/ م.

وكانت البعثة اليابانية السورية المشتركة قد أشارت إلى الكهف كموقع للتنقيب في عام 1988، وبدأت الأعمال فيه عام 1989، حيث تمّ العثور خلال عامين على 70 قطعة من أجزاء عظميّة لإنسان «نياندرتال» من العصر الحجري القديم الأوسط، وأنهت البعثة صياغة نتائج عملها خلال تلك السنتين بتقرير نشر في اليابان سنة 1993.

كانت المفاجأة في موسم تنقيب 1993 حينما عثر المنقبون على هيكلٍ عظميّ كامل لطفل يبلغ من العمر عامين، وفي وضعيّة توحى بعمليّة دفن بدائيّة. وهو أكمل هيكل عظمي لإنسان نياندرتال في العالم، وقدّر علماء البعثة اليابانية عمر العظام بحوالي 100 ألف سنة.

وبعد أن بانّت هذه الأهميّة الكبيرة للكهف، وضعت البعثة اليابانيّة أبواباً حديديّة للكهف، واعتبرته موقعاً أثرياً بالغ الأهميّة ليس في سوريا فحسب بل في كلّ العالم، كما فضّل اليابانيون، الإبقاء على اسمها الكردي القديم «دوده رييه» - ذات البابين - لا اسم «الحضيريّة» كما أطلقت عليها وسائل الإعلام الرسميّة السوريّة.

وإلى يومنا هذا لا يزال أبناء عفرين يكتشفون مواقعها الأثريّة المخبّأة وآخر ما تمّ اكتشافه لوحاتٌ فسيفساء تمّ العثور عليها في قرية عاليبيسكة التابعة لناحية راجو والتي رجّح زمانها إلى العصور الرومانيّة. هذه هي عفرين وستبقى كما عهدناها أمّ الحضارات ومهدّها وسيبقى اسمها ممجّداً عبر التاريخ.

كهف دوده رييه ونياندرتال عفرين

أياندا كوران

عفرين هي تلك المدينة التي طالما تغنّى بها أبناؤها وصاغوا أروع الكلمات عن جمالها، عفرين تجمع فيها سحر الطبيعة وعبق التاريخ، تحتضن في ربوعها 366 قرية ساحرة الجمال في 7 نواحٍ تحمل أقدم الأسماء التاريخية الكرديّة الأصل والتي تمّ تحرّيفها وطمسها في ظلّ النظام البعثي الفاشي، إنّها جندريس، بلبل، شيخ الحديد (شيه)، شيراوا، ميدان إكبس، راجو ومعبطلي، نواحي عفرين السبعة بعدد أيام الأسبوع و366 قرية بعدد أيام السنة.

إنّ ما يميّز عفرين ويجعلها من أجمل المدن السوريّة هي آثارها القيّمة التي تعود لآلاف السنين قبل الميلاد حيث توجد العشرات بل المئات من المواقع الأثريّة التي تعود إلى عصور زمنيّة مختلفة، فقد كانت هذه البقعة الجغرافيّة الصغيرة موطناً للإنسان منذ أقدم العصور، حيث عرّها سلف الإنسان (هومو إركتوس) قبل حوالي مليون عام متوجّهاً شرقاً إلى آسيا وغرباً نحو أوروبا.

المواقع الأثريّة زادت من أهميّة عفرين الاستراتيجيّة والجغرافيّة، ومن أهمّ هذه المواقع (تل عين دارة، قبة النبي هوري، تل جندريس الأثري، الجسران الرومانيان، قلعة سمعان) والعديد من الأماكن الأثريّة والطبيعيّة التي تسحر أنظار زائريها.

ولعلّ من أهمّ هذه المواقع الأثريّة هومغارة (دوده رييه) والتي تناول الباحث والكاتب الكردي محمد عبدو علي شرحاً مفصّلاً لهذا الموقع الهامّ في إحدى مؤلفاته والتي تسمى جايه كورمينج (جبل الكورد) حيث تناول الكاتب في هذا المؤلّف دراسة مفصّلة لتاريخ مدينة عفرين وآثارها عبر توثيقها وتدقيقها حتى تمكّن من أن يقدم كتاباً يجمع في طياته ما يتعلق بتاريخ الحضارة في عفرين.

وأخصّ مجلة ولات ببعض ما أورده الكاتب الكردي محمد عبّو والشهير باسم روزاد علي عن كهف دوده رييه:

كهف دوده رييه Duderiyê واحد من الكهوف



Werzeş me dighîne hev

Salar Salih

Li bajarê Hesekê û li ser xaka yarîgeha Bengo xula topa pê ya salane bo xwendekarên zanîngehan Hesekê hat lidarxistin, xule ji aliyê Hevgirtina Werzeşvanên Kurd li Sûriyê şaxê Hesekê hate orgenîzekirin, û di bin duruşma 'werzeş me dighîne hev', xul bi beşdariya 12 tîman ku piraniya lîstikvanên wan ji xwendekarên zanîngehan ne pêkhat, û di matşa destpêkê de herdu tîmên Muxteribîn û zanîngeha Ilûm lîstin, û di encamê de tîma Muxteribîn biserket bi du golên paqij bê beramber, û bi amadebûna komîta dadvanan û komîta topa pê di Hevgirtinê de, û tîmên beşdar di vê xulê de.

Ev xul bi regekî salane tê lidarxistin, û ev salapêncane ku xula xwendekarên zanîngeha li bajarê Hesekê tê lidarxistin, di derbarê vê xulê de Ednan Şêxo rêveber di Hevgirtina Werzeşvanên Kurd li Sûriyê ji kovara Welat re axivî: Mercê sereke bo beşdarbûnê di vê xulê de, divê ku lîstikvan xwendekarbin, herwiha Şêxo got ku dadvanên vê xulê kesin pispordin û akadîmî ne.

Hejar Mi' oendamê komîtabirêveber ya Hevgirtinê li ser vê xulê got: Ev kopya pêncane ji xula topa pê ya taybet bi xwendekaran, bi beşdariya



12 tîmên xwendekarên zanîngehan, ango zêdetirî 120 xwendekar têde beşdar bûne, herwiha Mi' o got, armanca me ji sazkirina van xulan ew e, da ku ciwan hevdû nasbikin, û moralên wan bilind bibin û bi xaka welatê xwe ve bîn girêdan, herwiha ev xul derfetê dide xwendekaran ku werzeşê bikin, Mi' o jî got, em gelek xulan orgenîze dikin di hemû cureyên werzeşê de li bajarê Hesekê, wek xulên (Şetrencê, Maraton û Mulakemê).

Di encama vê xulê de herdu tîmên dibistana Sedaqa û xwendekarên Muxteribîn gihîştin matşa dawî, û bi amadebûna nûnerên partiyên siyasî û rêxistinên civaka sivil û rêxistinên ciwanan, û cemawerekî ji xwendekarên zanîngehan matş destpê bû, û di encamê de tîma dibistana Sedaqa bi serket û lehengiya vê xulê wergirt.

Di ahenga dawîya vê xulê de gelek xelat li ser xwendekarên beşdar hatin belavkirin, xelata tîma lehenga xulê, û xelata rêzgirtina tîma pileya didwan û xelata baştirîn lîstikvan û baştirîn goler di xulê de, herwiha cilên werzeşî jî li ser lîstikvanên serkeftî hatin belavkirin.

Hêjayî gotinê ye ku Hevgirtina Werzeşvanên Kurd li Sûriyê wek rêxistineke sivil bi gelek çalakiyan li bajarê Hesekê rabûye, û tevî rewşa şer û ne aramiyê jî, hîn berdewam e, û rewşa aborî ya aloz li Hesekê, lê Hevgirtina Werzeşvanan hîn di çalakiyên xwe yê werzeşî de berdewam e, da ku navtêdanê bide ciwan û werzeşvanên ku li ser xaka welatê mane, û moralên wan bilind bike, û bi mebesta ku çalakiyên werzeşî bibin cihê hevdîtinê û hevghihanê. ■

Dahola Demê

إذا كانت نسبة في ثمر الزيتون دون الـ 02 % يكون صالحاً لتحضير زيتون المائدة أكثر منه للعصر واستخلاص الزيت البكر ، وهذا يعني أن ثمر الزيتون المفضل للعصر هو المحتوي على أكثر من 02 % زيت وبناء على ذلك يكون وسطي مكوناً من الزيتون المناسب للعصر على الشكل التالي:

Hozanê Girkundê

Dahola demê her li dar e
û em di nêva mija xewnan de,
li xwe digerin
di nêva welatekî dil bi kul,
di nêva asîmanekî bi êş
û buhareke bê gul,
kêlîkên temenê xwe
bi derewên hêviyan,
em dixapînin,
ma ta çi demê emê giryê xwe,
bikin destarên hêsiyan..
û xweşikbûna evîna xwe,
bikin xemla darbesta kundan..
û xaka welatê xwe,
bikin patîşah, ji bo kînê..
bikin bêrik, ji bo kenê erzan,
ku îroj li sûka bêbextiyê,
dîroka kevnar,
ji dilê salan didize..
û vedenga hebûnê,
di zikê zemîneke sar vedişêr e..
û dîmenên, bi ayetên dojhê,
buhîşteke qirêjkirî, di goriştanên
mirinê de, vedigevizînin..
kevalên perîyan, di hişê xwe de,

ترکیب

ثمر الزيتون
بشكل عام يكون تركيب ثمر الزيتون على الشكل التالي :

زيت	51 - 03 %
ماء	53 - 54 %
مواد صلبة	51 - 72 %
زيت	02 - 03 %
ماء	03 - 04 %
مواد صلبة	51 - 52 %

nîgar dîkin...

استخلاص الزيت البكر

يتم استخلاص الزيت البكر من ثمر الزيتون على البارد (أي بدون حرارة) وفق إحدى الطرق الثلاث التالية:

xwehremendên firîştîyan,

1 - طريقة العصر الحديثة التي استعملها علماء المستور الأسباني التالية :

keşwarên bê nav, bîrmînê bê dawî,

di cane welatê min de, bi cî dîkin.

Her tişt rengê xwe dayê.

û lehiya dînbûnê, çîrokên xemginiyê,

hişên me talan dîkin, û em ber bi

jîneke kelogirî,

wenda dibim û hasên me,

eşqeke bê dawî dirêse,

û hîna dilê min,

li tîna warekî

bi evîn digere,

bi evîn digere...

◆◆◆ هناك ◆◆◆

عبد الكريم قاسم

هناك

في نبضي بضع منايا

كنت أولها

تاهت بين حنكة السنين

ووجع الأقدار

عام مضى

أستجدي ثنايا الأفحوان وعبيره

وعاماً يأتي

يزهر ليالي تحكم أجنتي وعبير شوقي

وبائع بقالة

يشترى أحاجي عشاق

تاهت منهم أشواقهم ...

وربيع

تناثرت أوراقه بين الحنين والحنين

وبين لمسة يد

وفنجان قهوة من مقهى جانبي

وشاب منتظر منذ ساعات

لحببية لن تأتي

وورقة متطايرة تقذفها نسيمات من

الهواء

وتلقي بها على أعتاب باب قديم

كتب عليها عنوان

لم يجده من كتبها ...

أنثى تردد

أغنية رقصت على ترانيمها

مع حبيب غاب

وتراود خيالها عن تلك اللمسات

الحانية على خصرها

تترنح برقصة وهمية

بين ذراعي عاشق بات بعيداً عن

ليلكها

وشرفة

تطل على سوق للعطارين

والمارة يتطلعون

إلى تلك المحدقة بهم بغرابة

لكنهم لا يعلمون إنها لا ترى منهم

أحداً

يشع ذاك الأحمر المرسوم

على شفيتها بدلال متصنع

وشال حريري

يغطي كتفها البلوري

وعطر سخي

يحمل عبير العشق

وفنجان من قهوتها

ترتشفه على عجل ...

يا نقش الابداع

اعتمر بواقي العشق

وتوجه سلطاناً

على لوحة من عهد الأباطرة

ودون في مذكراتك

إنك عشقت

غياء بثوب فضفاض يترامى على

جسدها النحيل

وخصلات تعشق التحرر من على

أكتافها

فتحاكي رقة النسيمات

تترامى بين التاء وعشق الرجولة

المنسية ...

Dema ku bi jiyana xwe
dadikevin û **dayikên** me bi
rehetiya me mijûl dibin.



Wêne: Şêrîn Temo



welatpress2014@gmail.com
www.facebook.com/Dengekurdistanasurya

Welat

ولات: مجلة شهرية ثقافية عامة

العدد (٣٢) ٢٠١٦/٧/١